

Li Tirkiyeyê du hefteyên dawîn

15-30 Mijdarê, 2022

15ê Mijdarê, 2022

Qedexekirina medyaya civakî, daxwaza VPNê zêde kir

Di 13ê Mijdarê de ku êrîşa bombeyî ya li Kolana Îstîklalê li dar ket, li Tirkiyeyê daxwaza VPNê ji sedî 853 zêde bû. Piştî êrîşê, li seranserê Tirkiyeyê bi tengkirina bandê gihaştina medyaya civakî, hat astengkirin. Qedexeya ku bandor li Twitter, Instagram, YouTube û Facebookê kir, bi qasî 10 saetan dom kir.

VPN bi îngilîzî kurteya “virtual private network” e ku wateya wê “tora taybet a ferazî” ye. Girêdana VPNê cihê gihaştina înternetê vedişêre û rê dide mirovan ku ji tengkirina bandê xilas bibin.

Ji ber axaftina wê, cezayê girtîgehê li parlamentera berê ya HDPê Çaglar Demîrelê hat birîn

Parlamentera berê ya Amedê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Çaglar Demîrel, ji ber axaftina xwe ya di sala 2016an de kiribû dihat darizandin. Di encamê de 5 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn. Dadgehê eşkerekirina biryarê taloq nekir.

Demîrel di axaftina xwe ya 5ê Mijdara 2016an de got, “Êrîşa duh êrîşeke hevpar a çeteyên DAIŞê û hikûmeta AKPê bû. Çeteyan ev bombe, bi AKPê re, li dijî gel, li dijî HDPê, li dijî hîlbijartiyan, organîze kiribû. Em îro wisa difikirin ku hikûmeta AKPê hevserok û wekîlên me bi awayekî derqanûnî revandin û desteserkin.” Ji ber vê axaftinê Çaglar, li 14emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Amedê bi îdiaya “Bi eşkereyî heqaret li neteweya Tirk, dewlet, Meclîs, hikûmet û saziyên darazê kiriye” li gorî xala 301emîn a Qanûna Cezayê ya Tirk(TCK) hat darizandin.

Di 4ê Mijdara 2016an de li navçeya Bağlarê ya Diyarbekirê wesayîteke bombebarkirî hat teqandin. Bûyer nêzî avahiyekê qewimî ku aidî Midûriyeta Emnîyetê ya Parêzgehê ye û Midûriyetên Şaxê yên Têkoşîna Dijî Terorê û Hêzên Çekdar lê ne. Di encama êrîşê de ji bilî êrîşkar 12 kes ku di nav wan de 2 polîs, teknîsyenek û 8 hemwelatî hebûn hatin kuştin û nêzî 100 kes jî birîndar bûn.

17ê Mijdarê, 2022

Ji ber parvekirinên ku ne aidê wê ye cezayê girtîgehê li rojnameger Bêrîtan Canozê hat birîn

Rûniştina biryarê ya doza ku rojnameger Bêrîtan Canozê bi îdiaya “propagandaya rêxistina terorê li ser hesabê xwe yê medyaya civakî kiriye” li 4emîn Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê pêk hat. Canozê, “bi parvekirina nûçe û wêneyên endamên YPG/YPJê” dihat sûcdarkirin. Dozgeriyê îdia kir ku 4 hesabên medyaya civakî yên Canozê hene.

Bi hinceta ku li ser hesabê xwe yê medyaya civakî “propagandaya rêxistina terorê” kiriye salek 10 meh û 15 roj û ji ber parvekirina li ser hesabê “barîtansarya” ku ne aidî wê ye jî salek û 3 meh cezayê girtîgehê li Canozê hat birîn.

21ê Mijdarê, 2022

Li parêzera ku got "Jin, jiyana, azadî" doz hat vekirin.

Der barê endama Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (ÖHD) Aryen Turan de îdianame hat amadekirin. Aryen Turan ji ber ku di 22ê Cotmeha 2022an de li Lijneya Giştî ya Baroya Îzmîrê dirûşma "Jin, jiyana, azadî" avêt, hatibû binçavkirin. Di îdianameya ku ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Îzmîrê ve hat amadekirin de hat îdiakirin ku Turan ji ber axaftinên xwe "endama rêxistinê" ye.

Doza Parêzvanên Mafên Jîngehê ya Akbelenê

Parêzvana mafên mirovan Fûsûn Ergun, di 11ê Tebaxa 2021an de di berxwedana Daristana Akbelenê de hatibû binçavkirin.

Santralên Termîkê yên Yenîkoyê û Kemerkoşê dixwest ku li Îkizkoya Mîlasê ya li ser bajarê Mûglayê, li Daristana Akbelenê kana madenê ya lînyîte ava bikin. Fûsûn Ergun beşdarî çalakiya nobetê ya li dijî kanê bûbû. Di 15ê Çileyê 2022an de li 3yemîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Mîlasê bi hinceta ku heqaret li karmendekî dewletê kirine û nehiştine ku karmend erka xwe pêk bîne, der barê Fusun Ergun û çalakavaneke din a bi navê Guloren Demîr de doz hatibû vekirin.

Di danîşînên berê de parêzerên bersûcan daxwaza redkirina dadger kiribûn û Dadgeha Cezayê Giran a Bodrumê jî ev daxwaz red kiribû. Parêzerên bersûcan li dijî vê biryarê jî derketin û dosya ji nû ve ji Dadgeha Cezayê Giran a Bodrumê re hat şandin.

Di rûniştina çaremîn de ku di 21ê Mijdara 2022an de pêk hat, parêzerên bersûcan ji bo darizandineke adil pêk were xwest ku li benda encama îtirazê bê mayîn. Dadger biryar da ku li benda encama îtirazê bê mayîn û danîşîn taloqî 2yê Sibata 2023an saet 14.00an kir.

22ê Mijdarê, 2022

Polêsê ku rexne li xizmê Suleyman Soylu ye ku li mala polîsan dimîne kiribû demkî ji karê xwe hat bidûrxistin

Parlementerê Îzmîrê yê CHPyê Murat Bakan, der barê "Pêşnûmeya Guhertina Qanûna Perwerdehiya Bilind a Polîsan" ku li Lijneya Giştî ya Meclîsê hat niqaşkirin de axivî û diyar kir ku polîsek ji ber tweetek avetiye hatiye girtin û demkî ji karê xwe hatiye bi dûrxistin. Parlementerê CHPê diyar kir ku polîsê navborî li ser medyaya civakî parvekirineke rexneyî kir û diyar kir ku xizmê Wezîrê Karên Navxweyî Suleyman Soylu zêdeyî salekê ye li Mala Polîsan a Baltalimaniyê dimîne.

Doza Odeya Avahîsazan

Sêyemîn danîşîna doza ku der barê Seroka Şaxê û endamên lijneya rêveberiyê yên Odeya Mîmaran a Enqereyê de bi hinceta ku propagandaya rêxistina terorê kirine hat vekirin, di 22yê Mijdara 2022an de li 25emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê pêk hat.

Odeya Mîmaran di 29ê Îlona 2021ê de Merasîma Xelatên Çapemeniyê li dar xist. Di merasîmê de Guler Yıldız ji ber nûçeyên xwe yên li ser wêrankirina xwezayê, HES û kanên madenan, di qada Rojnamegeriya Televîzyonê ya Navneteweyî de xelat wergirt. Guler Yıldız di JIN TVya ji Ewropayê weşanê dike de bernameya xwe çê dike. Doza Odeya Mîmaran ji ber vê xelatdayînê hat vekirin.

Di danîşîna ku seroka şaxê û endamên lijneyê Tezcan Karakuş Candan, Ece Yoltay, Mustafa Ozgur Bayramoglu, Muteber Osmanpaşaoğlu, Nihal Evirgen Kabal, Tugba Arslan Konak û Unal Kara amade bûn de, parêzerên bersûcan ji bo amadekirina parastinê dem xwest. Rûniştin taloqî 13ê Çileyê 2022an saet 10:00an hat kirin.

Li Amedê daxuyaniya çapemeniyê ji bo rojnamegeran hat qedexekirin

Endamên Cemiyeta Rojnamegerên Dicle Firatê (DFG) û Platforma Rojnamegerên Jin ên Mezopotamyayê (MKGP) xwest ku ji bo nûçegihanê Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) Îsam Abdullah ê ku di êrîşa hewayî ya Hêzên Çekdar ên Tirk (TSK) ya li dijî Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê de jiyana xwe ji dest da, daxuyaniya çapemeniyê bidin. Daxuyanî ji aliyê polîsan ve bi hinceta "qedexeya walîtiyê" hat astengkirin.

Daxwaza girtîgehê ji bo rojnameger Reyhan Çapan

Duyemîn danîşîna doza Reyhan Çapan a Gerînameya Weşana Giştî ya Rojnameya Ozgur Gundemê pêk hat. Rojname di 29ê Cotmeha 2016an de bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de hatibû girtin. Reyhan Çapan ji ber nûçeyê bi sernavê "Kûjerên Zarokan" ku di 17ê Hezîrana 2014an de weşiyabû tê darizandin.

Di rûniştina ku li 2yemîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Stenbolê pêk hat de, dozgeriyê der barê Çapan de daxwaza cezayê kir.

Dadgeha ku biryara navbeynê çêkir, diyar kir ku parêzerê bersûcê ji bo dosyayê hincet nîşan daye û danîşîn taloqî 14ê Adara 2023an kir.

Der barê nûçeyê navborî de di 24ê Îlona 2014an de ji aliyê 3yemîn Dadgeriya Cezayê Sulhê ya Edeneyê biryar dabû ku bê sererastkirin û wekî tezkîbê weşandin. Di rojnameya 23ê Cotmeha 2014an de bi sernavê "Sererastkirin û Lêborîn" tezkîb hat weşandin. Lê bi hinceta ku ev tezkîb li gorî isûlê nehatiye weşandin dîsa doz hat vekirin.

24ê Mijdarê, 2022

Dozgeriyê ji bo tundiya zayendî got "delil tune ye", parêzerên Garîbe Gezer dîmen eşkere kirin

Garîbe Gezer bi îdiaya ku li Girtîgeha Tîpa Fyê ya Kandirayê ya Kocaeliyê tûşî êrîşa zayendî û îşkenceyê bûye, serî li darêzgêriyê da, lê serîlêdanên wê hatin piştguhkirin. Garîbe Gezer, di 9ê Berfanbara 2021ê de xwe kuşt. Serdozgeriya Komarê ya Kandirayê bi hinceta ku "têra xwe delil tune ye" biryar da ku pêdivî bi teqîbatê tune ye.

Li ser vê biryarê parêzerên wê di civîna çapemeniyê ya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Şaxa Stenbolê de wêneyên Gezer parve kirin. Wêne nîşan didin ku Gezer tûşî tundiya bûye.

17 rojnamegerên jin hatin girtin

Platforma Rojnamegerên Jin ên Mezopotamyayê (MKGP) rapora xwe ya sê mehan a binpêkirinên mafan ên mehên Tebax, Îlon û Cotmehê li avahiya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Şaxa Stenbolê eşkere kir. Li gorî rapora duzimanî, li rojnamegerên ku di van 3 mehan de hatin darizandin 16 sal û 24 meh û 59 roj cezayê girtîgehê û 30 hezar lire cezayê pereyan hat birîn. Hejmara rojnamegerên jin ên girtî 17 e.

25ê Mijdarê, 2022

Mamosteyê ku gul dan Meral Akşener sirgûn kirin

Der barê mamosteyê ku di 20ê tîrmehê de di serdana wê ya navçeya Bulancak a Gîresûnê de kulîlk dabûn Seroka Giştî ya ÎYÎ Partiyê Meral Akşener ji teref Midûriyeta Perwerdeya Neteweyî ya Parêzgehê ve lêpîrsîn hat destpêkirin.

Di çarçoveya lêpîrsînê de mamoste ji dibistana ku lê dixebitî, sirgûnî dibistaneke din hat kirin. Her wiha cezayê birîna destheqî li mamoste birîn.

Walîtiya Stenbolê ji bo Kolana Îstîklalê qedexeyên nû ragihandin

Walîtiya Stenbolê ji ber êrîşa bombeyî ya di 13ê Mijdara 2022an de pêk hat û di encamê de 6 kes mirin û 81 kes birîndar bûn, ji bo Kolana Îstîklalê qedexeyên nû ragihandin. Di nav qedexeyên nû de danîna mase û kursîyan a li kolanan, vekirina standan, firosyariya seyar, muzîkjeniya kolektîf û ferdî, organîzekirina çalakîyên civakî, çandî an bazirganî hene. Di daxuyaniya walîtiyê de xala "û her wekî din" li listeya qedexekirinê hat zêdekirin û bi vî awayî çalakîyên qedexe bi awayekî ji şîrovekirinê re vekirî hatin berfirehkirin.

Qedexeyên nû di roja 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinê ya Cîhanê de hatin ragihandin. Walîtiya Stenbolê ji bo rê li ber ketina Taksîmê bigire, 25ê Mijdara 2022an ji saet 15.00an pê ve îstasyonên Şîşhane û Taksîmê yên xeta Metroyê ya Yenîkapî-Haciosmanê û xeta Finukulerê ya Taksîm-Kabataşê girt.

Polîsan êrîşî meşa 25ê Mijdarê ya li Stenbolê kir

Li gorî daxuyaniya Platforma Jinan a Stenbolê ku bangawaziya meşa 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinê ya Cîhanê kir, di çalakiya 27ê Mijdarê ya li Kadikoyê de herî kêm 216 jin hatin derbîkirin û binçavkirin. Platformê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku destûr nedan parêzerên ku xwest alîkariya hiqûqî bidin girtiyan û ji rewşa wan a tenduristiyê agahdar bibin.

Di dema binçavkirinê de lingê Endama Sendîkaya Karkerên Hemû Otomotîv û Metalan (TOMÎS), Dilbent Turker şikest. Dûvre Turker di hevpeyvîna xwe de wiha got: "Polîsan pêşî ez li erdê kaş kirim û li min da. Dûv re da ku berxwedana min bişkînin, pehîn li lingê min xistin û lingê min şikand.

Ji bilî sê jinan hemû jinên li Taksîmê hatin binçavkirin, di 26ê Mijdara 2022an de hatin berdan. Der barê her sê jinan de ji dosyayên cihê biryara lêgerînê hebû. Ji kesên ku li Taksîmê hatin binçavkirin yek jê hemwelatiya Azerbaycanê û yek jî ya Îtalyayê bûn. Her du jin ji Midûriyeta Polîsan a Karakoyê birin

Navenda Bişûnveşandinê ya Selîmpaşayê ya li Sîlvriyê. Di 29ê Mijdara 2022an de biryara dersînorkirin û qedexeya derketina derve ya her du jinan hat dayîn. Parêzeran îtirazî biryarê kirin.

116 jinên ku li Kadikoyê hatibûn binçavkirin jî di 27ê Mijdara 2022an de êvarî hatin berdan.

Meşa ku dê li ser banga Tora Têkoşîna li Dijî Tundiya ya Amedê bihata lidarxistin, bi hinceta qedexeya çalakiyan a Walîtiya Diyarbekirê hat astengkirin.

Di çalakiya 25ê Mijdarê ya li Enqereyê de ji ber pankarta “Kurdistan”ê 7 kes hatin binçavkirin

Li Qada Sakaryayê ya Enqereyê, di çalakiya 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinê ya Navneteweyî de 7 jin ji ber pankarta ku vekirin hatin binçavkirin. Li ser pankartê wiha hatibû nivîsandin: “Ji Afganîstanê heta Îranê, ji Îranê heta Kurdistanê, ji Kurdistanê heta Tirkiyeyê, agirê femînîst venamire”.

Dozgeriyê îfadeya 7 jinan bi îdiaya ku “propagandaya rêxistina terorê kirine” girt. Jin, di 28ê Mijdara 2022an de bi şertê kontrola edlî hatin berdan.

30ê Mijdarê, 2022

Înfaza girtiya nexweş ku di mejiyê wê de tumor heye nayê taloqkirin

Ozge Ozbek di 22yê Mijdara 2011an de dema xwendekara Beşa Xizmetên Civakî ya Zanîngeha Hacettepeyê bû bi îdiaya "endama rêxistina terorê ye", 6 sal û 3 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn. Di rapora ku di 24ê Kanûna Pêşiyê ya 2021ê de hatiye nivîsandin de, ji aliyê doktoran ve wiha hatiye nivîsandin: "ne gunçaw e ku di şert û mercên girtîgehê de bimîne". Li gel vê raporê Ozbek nayê berdan. Saziya Tiba Edlî ya Stenbolê ragihand ku Ozbek dikare "di girtîgehê de bimîne"; lêbelê di nav doktorên ku rapor îmze kirine de îmzeya cerahên mêjî tune ye.

Ozbek piştî ku zanîngeh qedand, li Walîtiya Diyarbekirê wek Pîspora Xizmetên Civakî dest bi kar kir û di 27ê Cotmeha 2020an de ji ber tumora di mejiyê xwe de emeliyata mejî ya vekirî bû. Ozbek ji ber biryara girtinê ya piştî operasyonê li nexweşxaneyê ku lê dihat dermankirin hat binçavkirin.

Ji ber êşa wê ya zêde Ozbek di 21ê Mijdarê de rakirin Nexweşxaneyê Dewletê ya Fatîhê. Li gorî encamên MRê di mejiyê wê de zêdeyî 10 tumoran hene. Ji ber vê yekê di guhê wê yê çepê de ji sedî 70 kêmasiya bihîstinê pêk hat. Malbata Ozbek daxwaz dike ku di zûtirîn demê de înfaz bê taloqkirin.